


Aboriya cîhanê pêş
dikeve û ya Îranê paş
dikeve

»»» R:7



Hilbijartina
Cellad

»»» R:2




Danûstandin
bo çareseriya pirs
Kurd

»»» R:5



Neteweyên bê
maf pêşengê xe-
batê ne

»»» R:6



Doza Kurdî di
navbera “Cenevre”
û Qamişlo de

»»» R:8



*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasetî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (363) 07-12-2019 Buha (1000) Tûmen

Bêşermiya Cellad

Piştî ku di meha Xezelwerê de sedan kesên nerazî bi deştê Komara Îslamî hatne kuştin, yan jî hatin birîndarkirin, û hatin girtin û ketin ber lêdan û sivi-katîpêkirinê, faşizma zal di Îranê de careke din û bêşermanetir ji berê kopka (lûtkeya) bêşermiya xwe nîşan da.

Elî Xamineyî li ber-siva rapora “Şêvra Bilind ya Ewlehiya Neteweyî” derheqê nerizayetinîşandanên wê dawiyê de daxwaza dildaniya malbatên hemû kuştîyan kiriye, heta ew kuştîyên ku navbirî wekî “Eşrar” bi nav dîke!

Her li vê derheqê û di demekê de bi nav hilbijartineke din li çarçoveya rejîmê di paşerojê nêzîk de wê bi rê ve biçê, Şêvra Ewlehiya Neteweyî a rejîmê û Xamineyî bixwe basa vê yekê kirine ku ew hevvelatîyên ku hatine kuştin wekî “şehîd” bidin nasandin û bila malbatên wan herin jêr bandora “Bunyada Şehîd”!.

Ew “dilovaniya Îslamî” ku rejîm nîşan dide, di demekê de ye ku, heya niha Komara Îslamî amade nebûye



amareke raşt ji rêjeya kuştî, birîndar û deştêskerîyên bûyerên Xezelwerê belav bike, û amara Navendên Mafê Mirovan bi direweke mezin dide zanîn û xwenîşanderan jî bi “Erazêl û obaş” bi nav dîke.

Ew yek bêşermiya bêsînor ya deştîlategê ye ku hem biryarê bo kuştinê dide û hem jî biryarê bo lêborîna qurbanî û kuştîyan dide; Ne tenê bêşermî, belkî spîkirina rûyê hemû faşîstên dîrokê bi Hîtlêr û Stalîn ve.

Eva ku Xamineyî kiriye, fêleke nû ye bo xwederbaskirineke demkî li kirîza kûr. Kirîza nemana rewayiyê! Pîrsek ku berê jî di navendên hizrî yên rejîmê de hişdarî li ser dabûn û wekî kirîzeke mezin bi nav kiribûn.

Eva ku eşkere ye, Xamineyî û taqma wî, ne ji rûyê hezkirina xelkê Îranê û di warê mirovî de, belkî bo çewtekariyan û bona vê ku axê (xweliyê) bike nav çavên xelkê de, bi merema rakêşana xelkeke zêde bo ser sindoqên dengdanê biryarên wiha dij bi hev didin. Hekî ne, kîjan mejiyê saxlem heye, ku nezane dengdan di sistemeke wekî Komara Îslamî de wekî wê ye ku bêje, xelk dikarin diyarî bikin ku kî canê wan bikêşe.

Sergotar

Hilbijartina Cellad

N: Kerîm Perwîzî

Dema ku seranên rejîma koloniyalîst a hakim li Tehranê fermana girankirina benzînê dan, wisa dizanîn ku di dema nîveşevê de xelk kom nabe û roja Înê de jî hindêk nerazîbûnên sade bi rê ve diçin û bo Şemiyê ew rewş bi dawî tê û hekî kesek jî nerazî bû bi awayê herî tund wê lê bidin, û hemû ên din jî çavtirsandî dibin û biryara wan cih digre.

Lê dema ku di zêdetir ji 500 bajar û cihan li raserî Îranê de xelk daketin kolanan û meş û xwenîşandanan sertaserî parêzgehan bi xwe ve girt, matmayî man, û wê demê zanîn ku çi şaşiyeke mezin û kujer kirin, û bona derbazbûna ji vê kirîzê, Xamineyî ê cellad fermana kuştina bikom ragehand û bona veşartina tawanên xwe internet daxîstin û li cem xwe ve bi bêdengî û bi bê agehdariya cihanê deşt bi desrêja li ser xelkê bi armanca kuştinê kirin li raserî Îranê de.

Tawana Xamineyî û bandên wê di meha Xezelwera sala 1398-an de bi qasekê mezin e ku çi navek ji bilî kuştara bikom tu nikarî li ser danê. Kar ji serkutê derbaz bûye. Di rojên dawiyê de ku internet hêdî-hêdî hate vekirin û nûçe û rapor û vîdyo di asta cihanê de belav bûn, kûrahiya hovîtiya rijîmeke milhor û tawanbar derdikeve, ku bi tank û doşke û çekên giran ên eniyên şer berbirûyê xelkê asayî bûne, û heta zarok û nûciwan jî di nava xwînê de vegewizandin.

Ew vîdyo û wêne tenê renga di şerên navxweyî ên Kongo û Zeîr li Afrîqayê yan di dema êrîşa Muxulan bo herêmê de hatibe dîtin. Kuştara bikom ya Xezelwera 1398-an dawiya xebata gelên

Peyama hevxemiya Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ, bi boneya bûyera agirketina li holekê li bajarê Seqizê



Lêpirsyarê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê, bi boneya bûyera bijan û dilêş ya agirketina li holekê li bajarê Seqizê peyama hevxemiyê belav kir.

Peyamê wiha ye:

Mixabin bûyera agirkevtina talara Mange Şev li bajarê Seqizê ku bû sedama can jidestdana hejmarek ji xortên kurd û birîndarbûna dehan kesên din, em hemû xembar kirin.

Bi vê hilkefta cihê xembariyê, ez bi navê Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê, tevî xembariyê li derheq wê bûyerê, hevxemî û hevderdiya xwe digel malbatên rêzdar ên şehîdên wê bûyerê didme xuyakirin, û em hîvîdar in ku birînen birîndaran jî bi zûtirîn dem bicebirin.

Miştefa Hicrî

Lêpirsyarê Giştî yê Partiya Demokrat a kurdiştana Îranê

15`ê Sermaweza 1398`an

6`ê Kanûna Pêşîna 2019`an

Îranê nebû, belku deştpekek e bo qonaxeke din ya xebatê ku

tê de tewahiya civaka çendnetewe ya Îranê berbirûyê rejîma hov ya hakim li Tehranê de dibin.

Tirs di weha qonaxekê de ye ku Xamineyî û bandên ser bi wê, ber xwe winda kirine û her carê bi awayekî daxivin. Yek dibêje ku min hay lê nebûye, û yek dibêje ku tenê Xwedê em rizgar kirin. Yek ji wan dibêje ku eva şerekî cihanî bû bo me! Di van rojan de jî Xamineyî dibêje ku ewên ku di van bûyeran de hatin kuştin, wê efû bike û wê xwînbehayê bidin malbatên wan!

Wek vê ku tu bêjî dilovaniyeke mezin dike ku kuştar kiriye û kuştîyan dibexşe! Yanî ger Xamineyî wan nebexşe, naçin biheştê!! Bo derbazkirina vê rewşê rejîm cardin dixwaze ku maşkanêya hilbijartina meclisê bi rê ve bibe, û bi vî rengî du armancan dipêke:

Yekem, kuştarê bike bi meseleyeka asayî, ku civaka Îranê bi vê kuştar adet bike û bêje her demekê ku min hez kir ezê we komkuj bikim û jiyanê we di bindestiyê de wê berdewam be.

Duyem, bêje ku we tu hêviyek ji bilî dengdana bi celladên xwe nine. Xelkê Îranê jî dikarin li ser sinduqê rengûrûyê celladê xwe hilbijêrin ku hez dikin bi deştê kîjanî bêne kuştin.

Lê ew pîlanên rejîmê wekî hemû pîlanên din bi helwesta xelkê tene pûçkirin û cardin Xamineyî û bandên wê, wê heyrîmayî bimînin.

Şandeke PDKÎ di çileya taziya “Ebdulhemîd Derwêş” de amade bû

Şandeke PDKÎ di çileya taziya “Ebdulhemîd Derwêş”, siyasetmedar û tekoşerê naskirî yê Rojavayê Kurdistanê de amade bû.

Roja Şemî 9'ê Sermaweza 1398 (30'ê Çirriya Paşîna 2019'an), rêûresma çileya taziya “Ebdulhemîd Derwêş”, kasayetiyekî naskirî û xebatkarekî dêrîn ê Rojavayê Kurdistanê û avaker û serkirdeyê Partiya Demokratîk a Pêşveroya Kurd li Sûriyê, li salona Tewar a bajarê Silêmaniyê bi amadebûna sedan kes li xelk û nûnerên Part û aliyên siyasî yên parên din ên kurdiştanê birêveçû.

Şandeke PDKÎ bi serpereştîya “Roştêm Cehangîrî”, berpirsê Dezgeha



Çavdêrî a PDKÎ di vê rêûresmê de amade bû.

Di destpêka vê rêûresmê de, bi xulek bêdengî ji bo rêzgirtin li canê paqij ê şehîdên rêya rizgariya Kurdistanê hate ragihandin.

Piştî hilgirtina çil mûm ji aliyê mêvanan ve bi nîşaneya çihelê mîn roja koça dawî ya “Ebdulhemîd Derwêş”, “Elî Şemdîn”, endamê Mekteba Siyasî a Partiya Demokratîk a Pêşveroya

Kurd li Sûriyê, peyamek bi vê hilkeftê pêşkêş kir.

Herwisa peyama malbata “Ebdulhemîd Derwêş” ji aliyê “Kanîwar Derwêş”, endamê malbata xwedêjêrazî ve, cuda hate xwendin.

Di pareke din de, kurte filmeke dîkomêntarî li ser jiyana xebata wî xebatkarê dêrîn hate belavkirin.

Herwisa di vê rêûresmê de, peyama çend Part û aliyên siyasî bi vê hilkeftê hate pêşkêşkirin.

Şanda Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê jî, bi hilkefta çihelê mîn taziya wî tekoşerê dêrîn, peyama serxoşiyê bi navê Dezgeha Pêwendiyên Hizbê pêşkêş kir

Dewreyek din a siyasî ji aliyê Dezgeha Perwerde û Lêkolînê ya PDKÎ ve bi rê ve çû

Di berdewamiya karên Dezgeha Perwerde û Lêkolîneve a PDKÎ de, Çaremîn dewra aştî du û para yekem a siyasî taybet bi pêşmergeyan, birêveçû.

Çaremîn dewra aştî du û para yek, li rêketa 4'ê Xezelwera 1398'an, deşt pêkir û li roja Duşemî, rêketa 4'ê Sermaweza 1398'an, di rêûresmekê de bi amadebûna parek li endamên rêberî, kadir û pêşmergeyan PDKÎ dawî pêhat.

Rêûresim bi marşa netewî ya “Ey Reqîb” û bîstek bêdengî bo rêzgirtin ji canê paqij ê şehîdên Kurdistanê deşt pêkir.

Piştî “Teymûr Mîstefayî”, Endamê Navenda Siyasî a PDKÎ, çend gotinek pêşkêşê amadebûyên rêûresmê kir.

“Teymûr Mîstefayî” di axavtinê xwe de, basek li xwenîşandanên çend roj beriya niha a Rojhilatê Kurdistanê û Îranê kir û got: “Ger rejîmê bi awayekî dirindane xwenîşander serkut kir, lê eve destpêka qonaxeke nû ye li berxwedana xelkê Îranê

û nemaze Rojhilatê Kiurdiştanê.

Herwisa “Mîstefayî” basa vê yekê kir ku ger xwenîşander bi sedema bilindbûna nîrxa benzînê û rewşa nalebar, hatibûne ser şeqaman, lê her zû silogan û daxwazên xwenîşanderan hate guherîn bi “Nemana rejîma Îslamî a Îranê”, û berfirehbûna xwenîşanderan li pareke zêde a parêzgehên Îranê nîşanderê vê yekê bû ku, êdî xelk rejîma Îslamî a Îranê naxwazin.

“Mîstefayî” di berdewamiya axavtinên xwe de hewla Dezgeha Perwerde û mamostayên pêwendîdar bi perwerdeya pêşmergeyan bilind nîrxand û dxwaz ji amadebûyan kir ku bo xwepêgehandin û amadebûn bo hegerên paşerojê, li wan core dersan mifahê vergirin.

Her di vê derheqê de îşare bi çend xal û teybetmendiyên kadreke PDKÎ kir wekî: “Berêvebirin, his bi berpirsayetî kirin û xwepêgehandin û...hwd.”

“Mîstefayî” di dawiya axavtinê xwe de got: “Her



pêşmergeyek di nav civatgeha xwe de nûnerê Partiya xwe ye, û her ji bo vê jî hewceye ku li siyaseta Partiya xwe baş têbigihin.”

Piştî peyama Dezgeha Perwerde û Lêkolîneve ji aliyê “Sîna Qasimîzade” ve hate xwandin.

Herwisa peyama dewrê ji aliyê “Dilniya Lotfî” ve hate xwendin.

Di dawiya rêûresmê de dabeşkirina xelatan ji aliyê “Tiyûr Mîstefayî” ve bi ser kesane yekem heya sêhem hate parvekirin ku navên wan wiha ne: “Mihemed Qanî’î, Hîsam Rehmanî û Dilniya Lotfî.

Herifîna Îran di Îraqê de!



N: Elbûrz Roînten

Di demekê de ku xwenîşandanan di Îraqê de, çend meh beriya niha deşt pê kir, kê m kesî dikarî texmîna rewşa niha bike. Serkut û kuştina xwenîşanderan bi bê berçavgirtina daxwazên rewşa yê wan bi deştê hêzên nexuya û nêzîk bi Komara Îslamî, nek nebû sedema dawîpêhatina xwenîşandanan, belkî bû sedema sereke a berdwamiya xwenîşandana, û wisa kir ku serokwezîr deşt li kar bikêşîne.

Îraqek ku piştî Sedam pêngav ber bi demokrasiyê ve avêtibû, bi sedema mudaxilekirina rejîma Îranê roj bi roj ber bi xirabtirbûn ve diçû, û êdî gihîşte astekekê ku xelkê wî amade nînin dawî bi xwenîşandanan bînin ku heya bi armancên xwe negihîjin, armanaca herî kê m jî avakirina hikûmeteke serbixwe ye ku li jêr bandora Îranê nebe, û herwisa deştûrê bi awayekî çaksazî bikin ku bi navê demokrasiyê gendeliyê berfireh nekin.

Lê di wan bûyeran de ya ji hemûyan balkêştir eve ye ku di wan bûyerên wê dawiyê yê Îraqê de sê caran konsolxaneyê Îranê di hefteyekê de li bajarê Necefê hate şewitandin.

Sê car şewitandina konsolxaneyê welateke wekî Îranê di hefteyekê de li bajarê Necefê, wekî yek ji girîngtirîn cemserê ola Şî`eyan hilgire gelek peyaman e, ku dikare bi hêmaya bêzariyeke zêde ya xelkê welatên deverê û jêr kontirola Îranê bi teybet Îraq û heta Şî`e jî bizanin.

Lêkoler bas ji Xweriskbûna



xwenîşandanan dîkin, û tevî vê jî girîngtirîn daxwazên wan çaksazî û li dijî gendeliyê ne di hikûmeta Îraqê de, û Îranê berpsiyarê wê yekê didin zanîn, û amade ne ku bi wî awayî kerb û kîna xwe ji rejîma Îranê nîşan bidin.

Xelk bi giştî gihîştine vê encamê ku dibe deştê Îranê di Îraqê de kurt bikin, tenê rêya rizgariya Îraqê û çareseriya kirîzan, herifîna Îranê di Îraqê de dizanin û ji bo nîşandana wê mijarê jî, konsolxaneyên Îranê kirine armanca êrîşên xwe û şewitandine.

Herwekî ku rojnameya "Newyork Times"ê parek ji belgeyên nihênî eşkere kirin, Îran ji rêya danîna karbidestên nêzîk bi xwe ve, deşt bi ser piraniya organên birêveber ên Îraqê de girtibû, û bi wî awayî kontirola Îraqê dikir.

Eva ku pêş ji belgenamêyên nihênî de derkeve, wekî fakteke eşkere ji aliyê berpsiyarî rejîmê bixwe ve îşare pê dihate kirin ku, ev mudaxilekirine di pêxema îdolojiya Komara Îslamî de bûye, wan dixwast wan welatane wekî çepera pêşve ya berevanî ji rejîma Komara Îslamî bizanin, û bo vê ku berevaniyê ji Tehranê bikin dibe kontirola wan bi ser Beyrut, Demişq,

Bexda û Senayê de hebe. Lê xelkê wan welatan nemaze di Îraqê de amade nînin êdî wê jêrdestiyê qebûl bikin, û hewla herifîna Îranê di welatên xwe de didin. Bi taybet xelkê Îraqê û bajarê Necefê sê caran bi şewitandina konsolxaneyê Îranê, ew peyaman gelek bi eşkere dane Îranê.

Xelkê Îraqê baş dizanin, berpsiyarî Îraqî ku berpsiyar in ji hederdan û dizîna zêdetir ji 500 milyar Dolar ji serweta welatên wan, tenê bi piştevaniya Îranê dikarin wê postê bidesteve bînin. Herwisa sê car şewitandina konsolxaneyê Îranê di bajarê Necefê de, bi hêmaya kêşeya di navbera du merce`ên Şî`e wate Qum û Necefê jî bizanin, hekî bi awayekî eşkere nebe, lê kêbirkêyeke jêr bi jêr zêdetir ji wê kêbirkêyê jî, belkî nakokî di navbera Xamineyî û Sîstânî de bê hesibandin.

Hekî ev nakokî kûrtir be û rûyeke eşkere bi xwe ve bigre, dibe sedema kîneke zêde a xelkê Îraqê ji Îranê, çimkî wê demê hevsoziyeke olî jî namîne, wate bi wê dîtingehê ve jî, em dikarin paşeroja Îranê di Îraqê de aloztir û diwartir mêze bikin. Bêguman Komara Îslamî wisa hêsanî li wê çeperê paşekişiyê nake, heta gelek caran jî hewleke zêde daye

hekî nekare xwenîşanderan kontirolo jî bike, bi qazancê xwe li rê derxîne, lê heya çî qasekî kariye pêşî li sernixûniya deştîlata xwe di Îraqê de bigre gelek rohn nîne.

Lê ya ku em dikarin bi xatircemî ve bas lê bikin, xelkê wî welatî li siyasetên Îranê bêzar bûne. Deştbiserdegirtina rejîmê bi ser kîna xelkê de hêsan nîne, nemaze ku textê dîktatoriya rejîmê li navxwe jî hatiye hejandin.

Gelek caran dîktator bi xwe li pêxema bideştveanîna hêzên zêde ber bi qofiyê ve pêngavan diavêjin, em dikarin bas li êrîşa Hîtlêr bo ser Ewropa û Rûsiya û Bîrîtaniya, yan jî êrîşa Sedam bo ser Kuwêytê bikin ku çawa bûn bi binge-hên jînavçûna wan dîktatorane, eva ku em dibînin di hefteyekê de sê car êrîş kirine ser konsolxaneyê Îranê û dişewitînin, encama mudaxilekirineke zêde a Îranê di Îraqê de ye, pêşgirtin ji wê mudaxilekirinê ji aliyê xelkê Îraqê ve dikare bibe bi pêngaveke micid bo dawîpêhatina Îranê di Îraqê de, yan jî herifîna Îranê di Îraqê de mêze bikin.

Di heman demê de, herifîna Îranê di Îraqê û deverên din de, belgeyeke bo wê raştiyê ku, Îran li sernixûniya xwe ya dawî nêzîk bûye.

Danûstandin bo çareseriya pirs Kurd




N: Cemal Resûl Dinxe

Heyamek beriya niha Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) ê daxwaz kir ku Tirkîye bo çareseriya pirs Kurd digel partiyên wê para Kurdistanê danûstandinê bike. Pirsyarek tê mijiyê xwîneran ku xwe eva daxwazyêke nû nîne, kurd li her çar parên Kurdistanê hertimî ev daxwaza li dagîrkeran hebûye ku bo gihîştin bi çareseriya pirs Kurd danûstandinê bikin. Di Bakûrê Kurdistanê de, PKK yekem partî ye ku li dijî Tirkîyê bo mafê Kurd xebatê dike. Piştî wê HDP jî, partiyeke yasayî ye ku xebata parlemanî dike û dixwaze mafên Kurd ji rêya siyasî ve bidest bîne.

Serkevtin û binkevtina partiyên Kurdî di Bakûrê Kurdistanê de meşeke asayî heye, gelek caran partiyên Kurdî ên wê parê ku yasayî ne û cih û pêgeheke gelek baş hene, gelek caran jî rastî serlêşewandinê tîn. Xebata siyasî di yasaya Tirkîyê de bi sedema wê ku deştilatê deşt-bideşt dikin, şewaza xebata partiyan jî cudahiyek heye. Lê bila em bas ji wê bikin ku HDP-ê bo behsa danûstandinê dike, ev jî di wê demê de?

Yekem: Deştihlatdarên Tirkîyê dizanin ku rewşa Kurd di vî astê de namîne û nikarin jî, pêşî li xebata Kurd di wê parê de bigrin, ji bo wê jî daxwaza HDP-ê wekî kutana hesinê sar e.

Duyem: Partiyên wê para Kurdistanê dizanin ku Tirkîyê tirsî ji avakirina herêmeke Kurdî li Rojavayê Kurdistanê hebû, lewra êrîşî ser wê para Kurdistanê kir.



Herwisa Tirkîyê heya niha jî tirsî ji xwebirêveberiya Rojavayê Kurdistanê heye, çimkî dizane ku ew deştihlate di wê beşa coxrafiyayê de sînodar namîne.

Sêyem: Tirkîye givaşên derveyî û navxweyî li ser in, lewra baskirina civînê bo pirs Kurd di wê parê de pêka xwandina rewşa siyasî a Tirkîyê ye.

Civîna Kurd û Tirk bo gihîştin bi çareseriya pirs Kurd di wê para Kurdistanê de, ji aliyê partiyên Tirkîyê nemaze partiyên faşîst yê wekî, MHP û CHP-ê ve nayê qebûl kirin. Ji aliyekî din ve, karbideştên Tirk her bixwe dizanin ew mafên ku berê didane Kurdan, niha Kurd wan mafan qebûl nake û daxwaza mafên zêdetir dikin. Partiya AKPê, partiya Erdoxan ku niha deştihlat di deştê wî de ye, bixwe li rewşê baş de nîne, gefa vekîşîna partiyên Tirkî û Kurdî li parlemanî Tirkîyê bixwe narewayiyeke bi deştihlata Erdoxan re, her ji bo wê jî hekî Kurd daxwaza civînê û danûstandinê dike, ew yek li gor xwendina rewşa navxwe ya Tirkîyê ye.

Ji aliyek, din ve jî, Tirkîye ji aliyê welatên Ewropayî, Amerîka û Natoyê ve li jêr

gefê de ye, ku nabe mafê Kurd bînpê bike. Serkomarê Amerîkayê Tiramp piştî bûyerên Rojavayê Kurdistanê bi awayekî tund gef li Tirkîye û Kurd xwar ku êdî dibe hûn bixwe pirs Kurd çareser bikin û em xwe ji wî şerî nadin.

Niha pirsîyara vî yekê bikin ku gelo partiyên Bakûrê Kurdistanê di vî astê de ne, ku Tirkîye guh bo daxwazên wan şil bike?

Şiroveya vî pirsyarê eve ye, heya qasekê ev pirsyare rast e ku pêgehên wan bihêz nîne. Lê di rwarê siyasî de nemaze ku niha civatgeha cihanî bi taybet Ewropa daxwaz ji Tirkîyê dike bo çareseriya pirs Kurd dibe digel partiyan kom bibin, lewra ji bo me rohn dibe ku daxwazên HDP-ê bo danûstandinê pirsêke kêmnirx nîne.

Bakûrê Kurdistanê, di warê siyasî de, di asteke heştîyar de ye, ji ber vî ku dewleta Waşingtonê di siyaseta xwe de çareseriya pirs Kurd bal wan girîng e. Dubare bo me rohn dibe ku hekî Tirkîyê bersîveke bikirya jî bi daxwazkariyên HDP-ê nedaye, lê bo bîrûraya giştî û navendên siyasî yê cihanê girîng e. Ew mafê welatîyên Kurd ku di sala 2018'an de ji aliyê

dewleta Tirkîyê ve hatiye bînpêkirin wiha ne: "Gireva birçîbûnê, bînpêkirina mafê jinan, bînpêkirina mafên mirovî di dema şer de, bînpêkirina mafê zarokan, eşkence, bînpêkirina mafê azadiya siyasî, bînpêkirina mafên azadiya bîr û ramanê, bînpêkarî li derheq mafê girtiyan û bînpêkirina mafên siyasî". Ev yek parek in ji bînpêkariyên mafê welatîyên Kurd ku Tirkîye bînpê dike.

Gefên Tirkîyê li Kurd û haşa ji hebûna Kurd ku tenê li ferhenga xwe de dibîne û tundtir dike, lê dizane jî gefên wê bandorek tune ye, her ji bo wê em dikarin bêjin, niha bi awayekî pakanehisaba Erdoxan digel tevgerên Kurd gihîştîye metirsîtîrîn qonaxên xwe û sînorê tundûtîjî yê hemû deştihlatdarên çendîn dehikên derbasbûyî li dijî gelê Kurd derbas kirine. Heya kengê Tirkîye û Erdoxan wê siyaseta tund a piştgirêdayî bi kîn û tolhildanê li dijî Kurd, û li dijî siyaseta medenî û tevgera Kurd li Bakûrê Kurdistanê wê bi rê ve bibin, lewra Erdoxan neçar e rû li siyaseta piragmatîzm ya siyasî bike û deriyê danûstandinê bo çareseriya siyasî ya pirs Kurd li Bakûrê Kurdistanê vekirî bihêle.

Neteweyên bê maf pêşengê xebatê ne



N: Nûredîn Sofizade

Di welatê Îranê de ku piraniya akinciyên wê ji neteweyên bindest û bêmaf pêk hatiye, komê mirovên şovînîst yan bi nasnavên wekî “Ommeta Îslamî”, yan bi navê “milletê Îran”ê, cehd kirine ku bi dirêjahiya dîrokê desthilatê li dest netewa Fars de ragirin û bi wî awayî seha nasyonîzma berçavteng, anku şovînîzmên Fars zêde bikin û bona vê mebestê jî mana xwe û paraştina desthilat xwe, di tepeseriya neteweyên xeyrî Fars de dibînin.

Di Îranê de neteweyên wekî Kurd, Azerî, Erebi, Belûç, Tirkemen ji hemû mafê xwe yê netewî bêpar in û şovînîzma navendî herçî daxwazeke rewşa ya wan neteweyan e, bi cudahiya xwezî, dijî Îslamê û girêdayî bi bîhaniyan re hesibandine û daxwazên wan neteweyan wekî pirsê ewlehî li dijî deshilata navendî hesibandine.

Li vê derheqê de hertim nasyonîstên berçavteng ên bi navê opozîsiyona dijberî rejîma deshilatdar jî mixabin her bi vî nêrînê dîna xwe dide pirsê mafê neteweyan û digel hev hevberawer in.

Her lewma ku heke di Îranê de, serhildanek jî çêdibe, heke rejîm hinekê bi dest girêdayî digel bajar û deverên Fars akincî reftarê dike, lê di navçên netewên bê maf de bi dest beredayî û bêrehmanetir reftarê dike. Her demê ku nerizayetiyeke bi her hegerekê di Îranê de bête pêş û xelkê bîne serkolanan û xwenîşandanê bikin, rejîma Komara Îslamî heke çî cehdê dike û xwenîşandanê di seranserî Îranê de tepeser



û mat bike, lê hertim aştê tepeserî û kuştare di dewerên netewên bêmaf de, rijdtir kiriye û aştê hovîtiya xwe li ser wan netewane pitir daye kîvê.

Rejîm baş dizane ku heke di seranserê Îranê de serhildanek hebe, heke parek ji xelkê navend akincî û netewa Fars bi nîşana nerizayeti li hember arîşeyekê hatibine serkolanan û nerizayetiyeke di dîne kîvê, lê di nav netewên wekî, kurd, Belûç, Erebi û yê din de, ji bilî hebûna nerizayetiyeke li hember hemî pirsê seranserî, mesela daxwaziya maf û azadiya neteweyî jî di wan herêman de heye.

Çimkî ew netewane ji hemû mafê hatine bîparkirin, pîrsgerêka wan digel rejîmê êdî jî vî hindê derbas bûye, ku loman ji rejîmê bikin daku rêformê çêbike. Rejîm gelek baş hay li vî pîrsê bûye ku ew netewane

hertim li benda derfetekê ne daku mifahê jê wergirin û xebatê bikin bona bideştveanîna mafê netewîye xwe. Bêguman rejîm jî di her demê wisa de, tenê sernixûniya xwe di wan herêman de dibîne ku netewên bê maf tîde akincî ne, wekî Kurdistan, Xûzîstan, Sîstan û belûçîstan, û ...hwd.

Baştirîn mînak bo îsbata vî gotinê jî em dikarin amajê bi tepeserî û kuştara hovane ya ku rejîmê di wan navçana de encam daye bikin.

Rejîmê li Kurdistanê li bajarên Merîwan, Ciwanro, Kirmaşan, Sinê de, gelek bêrehmane singê xortên Kurd ku wekî hemû xelkê Îranê derketibûne serkolanan, dane ber gullan û kirine serad, xwîn, agir û barût, wê carê jî her bîna her car bû qismetê Kurdistanê û dehan xortên Kurd şehîd bûn.

Di herêmanê Erebi Ehwazê

de qada bajaran her wekî meydana şerê du dewletan lê kiribû, û bi taybetî li bajarê Mahşehrê de gola xwînê çêkir, û sedan lawên Erebi şehîd bûn.

Di herêmanê Belûçan de rejîmê wekî evê ku bo dagîrkirinê êrîş kiribe ser welatekî dîjim, bi tang û balafirên Belûçîstanê di xwînê de werda û cinayetê mezin encam dan. Bo evê ku aştê cinayet û xwînmîjiya rejîmê li dijî wan netewan, belav nebe, niha jî rejîmê nevêraye înterneta zaf bajar û deveran weke.

Ewa ku aştê dujminayetiya vî rejîmê digel netewên bindest û bêmaf dide xuyakirin, her ew mînakên dawîye bes in ku me bas kirin. Bêguman berhevdan û têgehîştina rejîmê li derheq wan netewane, tiştekî rast e û zû yan direng sernixûniya vî rejîmê dê her ji Kurdistan, Belûçîstan û Ehwazê dest pê bike.

Nerîna Lîderan



Mike Pompeo :

“Xelkê nerazî yên Îranê agehdarê gefên rejîma diz a Komara Îslamî bûne”.



Adil El-Cobeyir:

“Îran gefeke bo hemû deverê û êdî em nikarin çalakîyên dîjîmalkarî yên Îranê qebûl bikin”.



Brian Hook:

“Rejîma Îranê tenê zimanê tehrîman dizane”.



Hesen Rûhanî:

“Em amade ne ku hekî Amerîka Tehrîman li ser me rabike, emê digel Amerîkayê di çarçoveya girûpa 5+1 de bicivin”.

Aboriya cîhanê pêş dikeve û ya Îranê paş dikeve



N: Eskender Ceiferî

Rejîma Komara Îslamî dibêje tevî dorpêçên aborî li ser wî welatî, lê dîsa jî 23 jî sedî hawirdeya berheman ji bilî petrolê li wî welatî bi lihemberdana ligel sala berê zêde bûye. Ev di demekê de ye ku asta henardeya berhemên petrolê kêmtir bûye. Asta bazirganiya cîhanî a her welatekî nîşan dide ka gelo guhertinên navxwe ên aborî û pêwendîya wî welatî û desthilatdarên wî bi cîhanê re û siyasetên dewletan bi çi awayekî bûne.

Tevî ku pêwendîya Îranê bi Yekîtiya Ewropa re xurt nîn e û dorpêçên aborî jî nehatine rakirin û guman di bicîkirina Rêkeftina Etomî de ji aliyê Îranê ve heye, lê dîsa jî Komara Îslamî kariye wan dorpêçan heya astekê bê bandor bike. Îranê kariye di riya hevpeymanên xwe re bandora siyasetên xwe li ser aboriya xwe jî nîşan dide.

Amar û datayên di derbarê bazirganiya cîhanî de her meh tene nûkirin. Lê ev çar meh bûn ku Îranê ew amar belav nekiribûn. Ne Rêveberiya Xalên Sînorî û Bacê û ne jî dewletê, behsa sedema



direngketina belavkirina vî raortê nekiriye. Dijberên dewletê di vî baweriyê de ne ku aboriya wî welatî pêş neketiye û giranbûna xwarînan jî nîşanderê wê ye. Ew dibêjin dewlet bi sekinandina amaran mehanê û bi belavkirina amara zanyariyên nerast, hewl dide raştîyan veşêre û raya giştî bixapîne. Elî Teyîbnîya wezîrê Aboriya Nîştîmanî a rejîma Îranê li ser pêşketina aboriya wî welatî bi rengekî din difikre û dibêje gendelî jî sedemeke din a pêşneketina aboriya Îranê ye. Tekezê jî dike ku kompanyayên dewletê êdî bûne ciyê bertîlan.

Li gor wan zanyariyan ku Îranê belav kirine, aboriya wî welatî bi qasî 6 jî sedî di çar mehên derbasbûyî de pêş ketiye ku dike bi qasî 29 milyar Dolaran bi lihemberdana ligel sala berê.

Balkêş e ku çima zanyariyên zêdetir nayên belavkirina ku xelk bizane gelo çima henardeya ji bilî petrolê bi qasî 9 jî sedî daketiye lê hevdem

bi qasî 23 jî sedî hawirdeyê bilind bûye.

Rejîma Komara Îslamî tekezê jî dike ku pêşketina wan a aborî, ne bi henardeya ji bilî petrolê, belkî bi hawirdeya kelûpelan çê dibe. Lê ew amar û data, kelûpelên qaçax lixwe nagirin.

Cezayên aborî bi sedema programa etomî, ji aliyê civaka navdewletî ve li ser Îranê hatibûn sepandin, lê di rêkeftina 5 welatên zilhêz û Îranê de, biryara rakirina wan cezayan hat dayîn. Dorpêçên aborî bandoreke nerênî kirine ser pêşesaziya Îranê. Ji ber vî jî pêşketin û hevrikiya bi kompanyayên pêwendîdar re, ne tê dîtin û ne jî li bendê ye bê dîtin.

Sê salan beriya niha hin dorpêçên sînordar hatin rakirin û pişt re dîsa dorpêç hatin zêdekirin. Di dema ragihandina kêmkirina dorpêçan de Hesen Rûhanî serokkomarê rejîma Îranê ragihandibû ku rê li ber Amerîkiyan vekirî ye ji bo ku li Îranê weberhênanê bikin

Kolberekî Kurd li ser sînorê Pîranşarê hate birîndarkirin

Kolberekî Kurd ê xelkê bajarê Mihabadê, bi sedema teqeya raşterast a hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê, hate birîndarkirin, û piştê bo nexweşxana bajarê Pîranşarê hate veguhestin.

Pêka rapora ku gihîştîye Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê, roja Sêşemî, 12’ê Sermawezê, komek ji Kolberên Kurd li ser sînorê bajarê Pîranşarê, raştî gullereşandina raseras a hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê hatin û di encam de,




kolberekî Kurd ê bi navê “Celal Xalidî”, xelkê bajarê Mihabadê, bi dijwarî hate birîndarkirin.

Pêka gotina şahid halan, hêzên leşkerî yên hikûmetê, ew kolberê Kurd ê birîndarbûyî, kutane û cihê lêdanên wan li ser leşê wî xûya dike.

Ew Kolberê kurd ku pêyekî wî birîndar bûye, bona tedawiya pîzîşkî, bo nexweşxana bajarê Pîranşarê hatibû veguhestine.

Doza Kurdî di navbera “Cenevre” û Qamişlo de



N: Ebdulêzîz Qasim

Tevî ku kirîza Sûriyê piştî nêzîkî neh salan ber bi çareseriyek siyasî ve diçe, bi damezrandina komîteya destûrî di bin çavdêriya NY de, û nûnerê NY “Ger Pederson”, lê berovajî vê yekê rewşa kurdistana Sûriyê (Rojavayê Kurdistanê) aloztir dibe, nemaze piştî êrîşên artêşa Tirkîyê û çeteyên opozisyona sûrî li ser deverên kurdî li rojhilata çemê Firatê di navbera Girêspî û Serêkaniyê de, ku ev dever jî wekî devera Efrîn ket di bin dagîrkariya Tirkîyê de bi rêkeftineke navdewletî di navbera Amerîka û Rûsya û Tirkîyê de. Hêjayê gotinê ye ku êrîşa dagîrkariya Tirkîyê û çeteyên wê yên îslamî û Ereb li ser devera Serêkaniyê û Girêspî raştî reaksiyonek navdewletî hat bi taybetî ji aliyên hin dewletên rojavayî yên girîng wekî Fransa û Bîrîtaniya û herwiha yên Erebî wekî Mîsr û Erebîstana Si’ûdiyê, û li ser asta navxweyî hin îtinîsiyatîf hatin pêşkêş kirin ji bo



navbeynkariyê di navbera aliyên kurdî de ji wan jî îtinîsiyatîfa ceneral Şahîn Kobanî, fermanarê hêzên QSD, ku heta niha ne xuya ye ka heta çî radeyê ew dikare aliyên kurdî razî bike û PYDê ji PKKê cuda bike, da ku heta ENKSê û PYDê li ser bernamêyê hevbeş rêk bikevin?!

Tevî ziyanên mezin yên li miletê kurd li Kurdistana Sûriyê ketin, lê di baweriya min de hîn jî zû ye, ku em bikaribin aliyên serkeftî di kirîza Sûriyê de destnîşan bikin, ji ber ku heta niha ji bilî “twitt”ên serok Turmp li ser “twitt”erê, ti stratejiyek ji aliyê Amerîkayê ve derbarê rewşa Sûriyê nehatiye rojevê, ku helwesta Rûsya jî bêhtir li aliyê rejîmê ye, tevî ku gelek caran piştgiriya xwe ji bo mafên gelê kurd û pêkanîna diyalogê di navbera rejîmê û kurdan de dide xuya kirin. Wek diyar e ku civînên komî-

teya destûrî li “Cenevre” ber bi astengiyan diçe û dîtin ku ne rejîmê û ne jî opozisyonek ti pêgeh nîne di siberoja Sûriyê de, ji ber girêdana rejîmê bi Îranê û girêdana opozisyonek bi Tirkîyê ve, û çaverê ye ku di dema pêdivî de hin aliyê opozisyonek bi taybetî milîsên Koalîsyona Sûrî bikevin di nava lişteya terorê de ji ber têkiliyên wan yên fîzîkî û pîsyolojî bi rêxistinên terorîst re û pêkanîna tawanên dijemirov û şer li Efrînê û Serêkaniyê û tevî oparesyonên guhertina demografî li deverên Kurdan, ji ber wisa bi baweriya min rejîm û opozisyon tevî ku bi rêya Tirkîyê û Îranê ji hev nêzîk in, lê herwisa nikarin bibin xwedan îtinîsiyatîf û bi taybetî ku her du alî li dijî mafên gelê kurd dixebitin û ji ber jî vê yekê hêviyên kurdan bi diyalogê li “Cenevre” kêm in. Tiştê îro li Qamişlo dibe berovajî “Cenevre” ye, ku li

Qamişlo û li ser yek şeqamê tank û zerîpoşên Amerîkî û Rûsya û artêşa Rejîmê û hêzên QSD û car car yên Tirkîyê tene dîtin, ku dibe ev rêkeftina leşkerî di siberojê de bibe rêkeftineke siyasî, tevî hewldanên rejîmê yên cidî ji bo nêzîkkirina eşîretên Erebî digel kirîştiyanên deverê ji bo ku Qamişlo têxe di bin hejmongeriya xwe de, lê divê hewldanên rejîmê sernekevin û divê aliyên kurdî zû bigihîjin rêkeftineke hevbeş nemaze ku piştî bûyerên li ser erdê li rojavayê Kurdistanê, rewşa kurdistana Sûriyê bi taybetî ket di rojeva gelek civînên herêmî û navdewletî û raya cîhanî kişand û Qamişlo wekî hêlêke sor ya navdewletî hat nîşan dan û bû cihê pûtendaneke navdewletî, nemaze Amerîkî bi Qamişlo û kilîngehên petrolê li deverê, ku îro tevî ziyanên mezin lê hêjî Qamişlo û kilîngehên petrolê di destê hêzên QSD de ne, û divê kurd mifayê bibînin ji komdengiya navdewletî li ser şermezarkirina oparesyona leşkerî ya Tirkîyê li dijî maf û hebûna miletê kurd li Kurdistana Sûriyê, Kurd bi yekîtiya dikarin gemiya xwe ber bi qeraxê bigehînin, û derbarê vê yekê divê rola Hewlêrê û piştgiriya wê ya siyasî û diplomatî û mirovî ji Rojavayê Kurdistanê re di rojên teng û tal de ji bîr nekin, û helbet ku dikare piştgiriyeke mezintir bide di xweşiyê de.

Nivîskareka Kurd di Bajarê Kellardeşt a Mazenderanê de hate binçavkirin

Nivîskar û çalakvana medenî ya Kurd li bajarê Kellardeşt a girêdayî parêzgeha Mazenderanê, hate desteserkirinê.

Roja Duşemî, 27'ê Xezelwerê, “Mojgan Kawûsî”, nivîskar û çalakvana medenî ya Kurd a xelkê Kellardeşt a ser bi parêzgeha Mazenderanê, ji aliyê hêzên îtla'atê ve hate desteserkirin û ji qedera navbirî, ti zanînek ji ber dest, nîne.

pêka gotina çavkaniyeke age-

hdar, hêzên îtla'atê, êrîşî ser mala “Mojgan”ê kirine û bê nîşandana ti belgeyekî yasayî, navbirî desteserkirine.

Her wê çavkaniyê bas kiriye ku, ew nivîskare, bi tohmêta vê ku “di torên civakî de piştewanî li xwenîşandanên nerazî yên li bajarên Kurdistanê kiriye” ji aliyê hêzên îtla'atê ve hatiye desteserkirin.

Heya niha, li pey ketina malbata “Kawûsî” bo agehdar bûn ji qedera “Mojgan”ê, bê



encam mane.

“Mojgan Kawûsî”, çalakvana medenî ya bajarê Kellardeştê û ji aliyê çandî û hûnerî de çalakî hebye. Navbirî, amadekar, nivîskar û derhênerê kurte filma “Hîwî” ye ku dêkomêntarekî çirokiye li derheq metirsiya jînavçûna zimanê Kurdî di bajarê Kellardeştê de.

Ciwanekî Kurd dawî bi jiyana xwe anî



Ciwanekî Kurd ê xelkê de-verî Qutorî ser bi bajarê Xoyê bi sedema hejarî û givaşa jiyanê dawî bi jiyana xwe aniye.

Pêka nûçeya ku gihîştîye malpera “Kurdistanmedia”yê, roja çarşemî 13`ê Xezelwerê, ciwanekî Kurd ê bi navê “Sefer Mihemedî” û temen 23 salî, xelkê gundê Gewar a ser bi devera Qutor a girêdayê bajarê Xoyê, dawî bi jiyana xwe aniye.

Wî welatîyê Kurd bi sedema hejarî, bêhêvîbûn û givaşa

jiyanê dawî bi jiyana xwe aniye. Her di vê pêwendiyê de, “Leyla Ebdî Şiyana” xelkê gunda Wisoken a ser bi bajarê Mehabadê, bi sedema arîşeyên malbatî bi çekek bi navê tapir, dawî bi jiyana xwe aniye.

Pêka amarên ku Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê, di vê derheqê de belavkiriye, di destpêka Bihara îsal heya destpêka meha Sermazê de, heya niha 103 jinan hewla xwekujiyê dane, û di nav wan 103 kesan de, Sê kes li xwekujiyê rizgarbûne.

Dersxwanên çend gundên derdora bajarê Urmîyê di kanêksan de dersê dixwînin



Di devera Soma û biradustê ya ser bi bajarê Urmîyê de, nêzî 30 dibistanên kanêksî hene, û berpirs û karbideştên rejîmê jî her carê terhekê di-din heya carek din.

Di devera Soma û biradustê ya girêdayê bajarê Urmîyê de, nêzî 30 dibistanên kanêksî hene, û dersxwan di wan kanêksên sar de dersa xwe didomîn in.

Her di wê deverê de, dibistana gundê Memekanê ku nêzî 250 dersxwan tête mijûlê dersxwandinê ne, heya niha jî kanêksî ye, û berpirsên rejîmê jî her roj tînin û bo terheke nû kulingekê lêdidin û heya carek din.

Nêzî çar sale berpirsên rejîmê tîne wî gundî û merasimeke mezin digrin û kulingekî li erdê didin û heya

carek din. Berpirsên rejîm di 20`ê Pûşpera îsal de jî, disan her wekî hertimî merasimeke mezin di gundê Memekanê de girtibûn, û soz dabûn di Rezbera Îsal de dibistanekê ava bikin, lê heya niha 6 meh jî li ser sozên wan ra derbas dibe, û ew terhen han her ji ser kaxezan mane.

Devera Somaubiradust ku nêzî sînore Tirkîyê ye, demsala sir û seqamê zû tê, û dibistanên kanêksî di wî demsalê de wekî bûzê lê tînin.

Bi wî awayî zarokên wî deverê rastî pîrsgirêkan hatine, gelek caran bi sedema sirê nexweş dikevin, gelek caran jî dest ji xwendinê ber didin, û rejîm jî tu fikrekî bi halê wan re nake û tenê di fikra kiriyarên terorîstî li derveyê welate.

Dr. “Reşîd Kurmanc” bi 5 salan hepsê hate cezadan

Mamoştayekî zanîngehê, û xelkê bajarê Bokanê, ji aliyê dadgeha Keyferî ya wî bajarî ve, bi 5 salan heps hate cezadanê.

Pêka rapora ku gihîştîye Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê, taya 101 a dadgeha Keyferî a bajarê Bokanê, Dr. “Reşîd Kurmanc”, mamoştayê zanîngehê, bi 5 salan hepsê ceza da.

Ew mamoştayê zanîngehê bi tohmata “Bêrêzikirin bi rêberê rejîmê û alîkarîkirin digel yek ji Partiyên Kurd yê dijî hikûmeta Îranê”, hatiye cezakirin. Ew mamoştayê Kurd, di derheq wî cezayê de, nerizayeti-

yên xwe nîşan daye û dosyeya navbirî bona pêdeçûnê, bo dadgeha pêdeçûnê, hatiye veguhestin.

Dr. “Reşîd Kurmanc” di meha pûşpera Îsal de, bi tohmata “Bêrêzî kirin bi rêberê rejîmê û alîkarîdan bi yekek ji partiyên Kurdan yê dijî hikûmeta Îranê re”, hatibû desteserkirinê û piştî jêpîrsînê, bi danîna barmiteya 500 milyon tûmenî, bi awayekî demkî ji girtingehê hate berdanê.

Ew mamoştayê zanîngehê, derçûyê duktoreya wêjeyî a zimanê Farsî li bajarê Moskoyê bûye û di zanîngehê



bajarên Mihabad, Seqiz, Bokan û zanîngeha Soran di herêma Kurdistanê de wane gotine.

Dr. “Reşîd Kurmanc” niha rûniştîyê bajarê Mihabadê ye û ji wane gotinê hatiye bêparkirin.

Ez im û ez



H: Îbrahîm Qasim

Ey hewar

Ji mêj deye ev kevteleft
Ji mêj deye ev hingavtin
Bê qidoş
Tenê ez

Di nava xwînê de digevizim
Pêşîrên dayka min dişerdin
Kezeb û hinavên min
diherşin

Ey hawar

Kovan e

Bilûra min dinale

Axîn û ahînan

Kurahîya birînan
Şirove dike

Ey hawar

Tenê ez

Pêlên derya kevanan diher-
ifîne

Vêlê û gemyan bê ser û şûn
dike

Bê rawestan
Jînhez berxwe didin
Tenê ez
Ne melevan im
yariya têde ne lehîştvanek
şareza me
Ne hatime perwerdekirin
Ji daykbûnê ve
Ji dîroka bûna min ve

Ey hewar

Tenê awazên bilûra min

Şêfreyeke aloz e

Telasim in

Tê nagihim

Tenê ez

Dizanim

Awazên min
Kul û kovan û derd in
Ey hawar

Binose

Tenê ez

Ne zîrek û şareza me

Ne hezkirê tu kesa me

Ber pî û dest û linga me

Tenê ez

Ji jînê re ne amade me

Her xwe min dît tenê ez

Çimkî ez im ez û ez

Girûpa govend a Dîlan, xelata xwe pêşkêşî netewa Kurd kir

Girûpa govend a Şêxanî ya bi navê Dîlan, xelata xwe ya bideştixistî di festîvala Îspaniyayê de, pêşkêşî netewa Kurd kir.

Roja Duşemî 11`ê Ser-mawezê, girûpa govend a Şêxanî ya bi navê Dîlan, wekî yekem girûp ji Kurd-istanê, ku bi awayekî fermî bo festîvala Giranfişt a li Barselonaya Îspaniyayê hatibû gazîkirin beşdarî kir, û karî pileya 2`emîn bi dest bîne.

Wî girûpê di dema vergirtina xelatê de, Şehab Mûsayî ser-pereştê girûpa Dîlan bi navê hemû endamên girûpê axivî û xelata xwe pêşkêşî hemû gelê Kurd kir.

Girûpa govend a Dîlan di nava 33 girûpan de piştî girûpa welatê Rûsiyê, karî pila 2`emîn ya vê Festîvalê bideşt ve bîne.

Levra serkevtina girûpa Dîlan a xortên Kurd ji Ur-miyê ve, bû cihê keyfxweşiya hemû Kurdekê û nûçeya vê serkevtinê, şeva derbasbûyî li ser torên civakî, dengwe-daneke mezin hebû.



Girûpa govend a Dîlan di du parên cuda de bona nîşandana çendîn curên govend û dîlana Kurdî li curên Şêxanî, li ser sinê amade bûn.

Girûpa Dîlan Sala 1395`an ji aliyê komê ji xortên Kurd ve di bajarê Urmîyê de hatiye avakirin, heta niha bi kincên xwe yên Kurdî û axabanî û dehan cur ji govendên Şêxanî, di çendîn Fes-tîvalên cihanî de beşdarî kiriye û hemû carê jî serkevtin û pileya baş bi dest xistine.

Zimanê Kurdî

6- Cînavên Peywendî

Ev cînav jî, weku gelek mijarên zimên di nivîsarên rêzimanî de bi çend navlêkirinên têvel hatine danasîn .

- Celadet Bedirxan Ew bi navê “Pronavên Xwe-malîn” şirove kirine . - Kamîran Bedirxan navê “Pronavên Deştanî” li wan kiriye . - Reşîdê Kurd ew bi navê “Bernavên Arzî” dane nasîn . - Feqe Huseyn Sagnîç navê “Cînavkên Peywendî” daye wan . - Qenatê Kurdo ew kirine “Cînavên Eleqedarî”. - Sadiq Behadîne Amîdî jî, navê “Cînavên Heyî” li wan kiriye . Lê Şarezayên Kurmanciya Xwarê (Sorani), ew cînav bi navê “Ranawî Hî” xebitandine . Diyar e ku ev navlêkirin tev, ji hêla wateyê ve nêzî hev in . Hemû bi wateya cînavên (xwedîtî, xawenî, peywendî, milkî...) bikar tên. Li gora watedariya van cînavan di hevokên core-cor de, min jî navê “cînavên Peywendî” peji-randiye . Bi dîtina min, têgeha vê navlêkirinê berfireh e, wateyên navên dîtir jî bi xwe ve digre . Cînavên peywendî ew cînav in, yên ku cihê navên mirov, canewer û tiştan digrin û peywendiya wan navan bi nav û cînavên piştî xwe ve destnîşan dikin.

Wek : - Rezê Hemo avî ye, lê yê Reşo dêm e. [Rezê Hemo avî ye, lê (rez) ê Reşo dêm e] . - Bizina Zînê avis e û ya Fatê stêwr e [Bizina Zînê avis e û (bizin) a Fatê stêwr e] . - Birayên te karker in, lê yên min tiral in . () [Birayên te karker in, lê (bira) yên min tiral in].

Di van mînakan de cînavên (yê, ya, yên) cihê van navan (rez, bizin, bira) girtiye . Ev cîgirtin jî, şêwazekî rewanbêjî ye, çûnkî ku ev cînav li şûna wan navan bikar nehatana diviya ku ew nav dûbare bibûna Wek: - Birayê min û birayê te û birayê Zînê heval in (Birayê min û yê te û yê Zînê heval in)

Çawa şarezayên zimanê kurdî di warê navlêkirina van cînavan de ne wekî hev gotine, wilo jî di warê destnîşankirina forma wan de ne wekî hev gotine . Celadet Bedirxan, Reşîdê Kurd û Kamîran Bedirxan di nivîsarên xwe de dibêjin, ku ev cînavên peywendî lêkdayî ne (hevedûdanî ne), ji cînavên xwerû “yê, ya,yên” û cînavên “kesîn, xweyî û nîşandan” pêk hatine . Wek : 1- Yê min,yê te, yê wî, yê wê, yê me... - Ya min, ya te, ya wî, ya we... - Yên min, yên te, yên

wan.... 2- Yê xwe, ya xwe, yên xwe 3-Yê vî, yê vê, yê wî, yê wê, yê van - ya vî, ya wê, ya wan...

- Yên vî, yên wî, yên van...

Kamîran Bedirxan cînavên pirsîyarî jî dispêre wan cînavên peywendî : - Yê kê ye ? - Ya kê ye ? - Yên kê ne ?

Lê rêzimanzanên dîtir, wek “Qenatê Kurdo, Sadiq Behadîn Amîdî, Feqe Huseyn Sagnîç û şarezayên kurmanciya xwarê dibînin ku cînavên peywendî ev tenê ne: “yê,ya,yên”() . Bi dîtina min jî, cînavên peywendî ev cînavên xwerû (sade) tenê ne. Ji ber ku ev cînav ne li pêş cînavên kesîn, xweyî û nîşandan tenê bikar tên : 1- Li pêş navan :

- Ev hespê te ye, ka yê Memo ?

2- Li pêş hevalnavan (rengdêran) : - Gula sor bo te ye û ya zer bo Zînê ye . 3- Li pêş hevalkaran (hokeran) : - Sala par zuha bû, lê ya pêrar pirbaran bû . 4- Li pêş karan (kirinan, lêkeran) : - Mirovê bipirse û yê nepirse ne wekî hev in. Vêca ku rast “yê wî” cînavêkî pêwendî be, gerek “yê Memo” jî ew cînav be. Çûnkî “wî” dikare cihê “Memo” bigre : - Ev yê Memo ye = Ev yê wî ye . Helbet, ne diruşt e ku cînavêk û navek, bi hev re bibin cînavêkî lêkdayî . Ji hêla dengsaziyê (fonîtîkî) ve jî, heger bêjeya berî van cînavan bi tîpeke dengdar (bêdeng) kuta bûbe gerek cînav bi şêweyê “ê, a, ên” bikar bên :

- Ji van hespan, ê pêşîn baş e.

Lê ku ew bêje bi tîpeke dengdêr kuta bûbe, gerek tîpa navbirra dengan (y) bikeve ser cînavan (yê, ya, yên) : - Ev hevalê min e, ka yê te ?

Di şêwezarê kurmanciya xwarê de cînavêkî peywendî bi tenê heye, ew jî “hî” ye. Bilêvkirina vî cînavî jî herêmekê ta herêmekê tê guherîn : - Li Silêmaniyê dibêjin, “hî” . - Li Kerkûkê dibêjin, “hîn” . -Li Hewlêr, Rawendûz û Mehabadê dibêjin “î”. (S.B.Amîdî) - Li Efrînê (Sûriyê) jî ev (î) tê bihîştin : - (î ji Xwedê xafil e kafir e) Zayend û çendaniya cînavên peywendî li gora zayend û çendaniya navên avêtî, yên ku ev cînav li şûna wan bikar tên, destnîşan dibin . - Li şûna navê nêrzayê yekjimar cînavê “ê, yê” bikar tê : - Birayê min ji yê te mezintir e . - Li şûna navê mêzayê yekjimar cînavê “a, ya” bikar tê : - Xuşka Zînê ji ya Fatê biçûktir e . - Li şûna navên nêrza û mêza, yên komjimar cînavê

“ên,yên” bikar tê :

- Mêrên karker ji yên tiral baştir in .

Dom heye...

Keç û dayîkek bi 70 derbên qamçyan û 8 meh hepsa te`izîrî hatine cezadan

Cezayê lêdana 70 derbe qamçî bo welatiyeka xelkê bajarê Xoyê, ji aliyê Nivîsîngeha birêveberî ya cezayên dadgusterî a wî bajarî ve birêve çû.

Roja Pêncşemî heft-eya derbasbûyî, 7`ê Sermawezê, “Silbî Merendî” pîrejineke 80 sal a xelkê bajarê Xoyê, ku bi lêdana 70 derbên qamçî, ji aliyê dadgeha giştî ya bajarê Xoyê ve hatibê cezadanê, piştî gazî kirina wê ji aliyê

birêveberiya cezayê dadgusteriya bajarê Xoyê ve, cezadana wê hate cîbecîkirin.

Ew welatiye, piştî cîbecîkirina cezaya lêdana 70 derbe qamçî, û bo derbaskirina heyamê 8 mehan hepsa ku li ser wê de hatibû sepandinê, bo benda jinan a girtîgeha Xoyê hate veguhaştin.

“Silbî Merendî” dayîka “Bêhroz Zêynalnijad”, hepsiyê canjidestdayî yê girtîgeha

Xoyê ye, piştî ku wî hepsiyê 5 rojan di girtîgehê de girev girit, bi awayekî bişik, canê xwe ji dest dabû.

Berpîrsên girtîgeha Xoyê, can ji dest dana wî welatiyê, bi xwekujî dabûne zanîn, û malbata “Bêhroz Zêynalnijad”, piştî nepejirandina wê gotinê, serdana nivîsîngeha berpîrsê girtîgehê kiribûn ku di encama reftarên xirab a berpîrsê girtîgehê û dadwerê çavdêrî



yê girtîgehê, bo sedema şer û têkdana tiştên nav nivîsîngehê.

Tora Mafê Mirov a Kurdiştanê, di vê derheqê de balavkiriye ku, piştî şikayeta berpîrsê girtîgehê û dadwerê çavdêrî girtîgehê ji wê malbatê, dadgeha giştî ya bajarê Xoyê, cezaya lêdana 70 derbên qamçî û 8 meh hepsa te`izîrî, bi ser “Silbî Merendî” û “Atife Zêynalnijad” de sepand, û heya niha jî, “Atife Zêynalnijad” ji xwe nasandin bi dadgehê re, xwe paraştiye.

Caşan di serkut û Şehîdkirina neraziyên Merîwanê de dest hebûne

Spaha Pasdaran a terorîst, bo serkut û Şehîdkirina xelkê nerazî di bajarê Merîwanê de, mifah ji caşên xwe vergirtibû.

Pêka nûça ku gihîştîye Malpera “Kurdiştanmedia”yê, Spaha Pasdaran a terorîst, bo serkuta xelkên nerazî di nav xwenîşandanên wê dawiyêde, li bajarê Merîwanê, li caş û bi kirêgirtiyên xwe mifah vergirtiye. Sîrwan Burzuîpûr, yekek ji wan caşane ye ku raşteraşt teqe li xwenîşanderan kiriye.

Çavkaniyekî agehdar ji zimanê yekek ji endamên Spaha Pasdaran a terorîst ve bi “Kurdiştanmedia”yê re got: Sîrwan Burzuîpûr tevî ku erkê gemara rahênana pasdaran li stuyê wî ye, di wan xwenîşandanên wê dawiyê de li bajarê Merîwanê, berpîsê gurûpek a serkutkirina xelkê bûye û bona ser-



kuta xelkê çûye ser şeqaman.

Her wê çavkaniyê gotiye: “Di nav binkeyên Spahê de hatiye baskirinê ku, Sîrwan bi xwe teqe li xwenîşanderan kiriye û bi zareke gemar fermama gulle reşandinê bo ser xelkê xwenîşander bi tîma xwe re daye”.

Herwisa wê çavkaniyê daye zanîn ku, Sîrwan Burzuîpûr ji hejmarek caşên Merîwanê mifah vergirtiye, û ji wane li kesek bi navê Zaniyar Barname ku ji caşên ser bi malbata caşperwer a Barname di Merîwanê de ye.

Herwisa wê çavkaniyê got ku, piştî dawîpêhatina xwenîşandanê, niha Sîrwan raşteraşt erkê îşkencedana desteserkiriyan li situyê xwe girtiye. Sîrwan caşekî xelkê bajrê Merîwanê ye û berê jî endamê banda Hîwa Tab bûye. Navbirî di wî bajarî de, xwediyê başgahekî werzişî ye û wekî kesekî bê exlaq di nav xelkê de tê naskirin.

Mayik Pompêo: Xelkê nerazî yên Îranê agehdarê gefên rejîma diz a Komara Îslamî bûne.



Wezîrê Derve ê Amerîkayê û Serokwezîrê Îsra`îlê li derheq pîrsên cud û nemaze pîrsa Îranê di welatê Portuxalê de civîn kirin.

Roja Çarşemî 13`ê Sermawezê, Wezîrê Derve yê Amerîkayê Mayik Pompêo û Serokwezîrê Îsra`îlê Binyamîn Netanyahu, di bajarê Lîstbon a paytexta welatê Portuxalê de li derheq pîrsên Îranê civînek pêk anîn.

Di wê civînê de, Wezîrê Derve yê Amerîkayê daye zanî ku, şewazê bicîhkirina aramî di Rohilata Navîn de, xwenîşandan di Bexda û Bêyruetê li dijî rejîma Îranê û eva ku em

hemû dizanin di Îranê de çi diqewime, evane hemû mijarên civîna Danalîd Tiramp di Lendenê de ye.

Herwisa Pompêo daye zanîn ku, ev xelkê nerazî kesaniyê in ku li pey azadî û bi awayekî aram jîyan kirinê ne, û li derheq gefên ku rejîma diz a komara Îslamî ya Îranê birêve dibe, pêhesiyane.

Herwisa Binyamîn Netanyahu Serokwezîrê Îsra`îlê jî di destpêka axavtinê xwe de got: “Yekem mijara ku em dixwazin di vê civînê de bas bikin, Îran e, duhemîn mijar jî Îran e, û Sêhemîn mijar me jî her Îran e.

Herwisa Binyamîn Netanyahu Serokwezîrê Îsra`îlê daye zanîn ku, rejîma Îranê dixwaze di navxweyî welatê xwe de, ji Îraq, Sûriye, Lubnan û Yemenê li dijî me mifahê vergire, lê em bi awayekî çalakane li dijî wan sekinî ne.